NORDKURDISKA

Sinifê pêşdibistanê ji bo zaroka te ye

BROŞUREK LI SER SINIFÊ PÊŞDIBISTANÊ

Skolverket

Zaroka te wê dest bi sinifê pêşdibistanê bike

Di vê broşurê de agahîyên li ser sinifê pêşdibistanê û wezîfeyên wê nivîsandîne.

TU GIRÎNG Î

Yê herî nêzîkê zaroka xwe tu yî. Lewra nêrînên te yên li ser pêşdibistanê girîng in.
Eger tu nêrîna xwe ji personelan re bêjî ew dê baştir bikaribin alîkarîya zaroka te bikin.

Ji bo ku tu bikanibî tesîrekê lê bikî divê tu bizanibî bê sinifê pêşdibistanê çawa dixebite.

Ber bi heman armancê ve

Qaîdeyên sinifê pêşdibistanê hem di qanûna dibistanê hem jî bernama perwerdê de cî digrin.

Beşê nihê yê qanûna dibistanê li ser sinifê pêşdibistanê ye. Li wir tê nivîsandin ku gerek pêşdibistan pêşveçûna zarokê û fêrbûna wê teşwîq bike û ji bo perwerda pêş de wan amade bike. Perwerda sinifê pêşdibistanê belaş e, lê hin mesrefên bêqîmet dikarin hebin. Sinifê pêşdibistanê herî kêm 525 saet in û salekê tê xwendin; termîna payîzê û ya biharê.

BERNAMA PERWERDÊ

Hikûmetê bernameyeke nû ya perwerdê ji bo dibistana bingehîn, sinifê pêşdibistanê û mala dema vala tesbît kirîye. Bernama perwerdê ji termîna payîza 2011ê û pê de derbas dibe.

Dibistanên taybet (specialskolan) û yên samî (sameskolan) bernameyên xwe bi xwe hene. Ew bêhtir dişibin yên dibistana bingehîn. Zarok dikarin li dibistanên taybet û samî jî biçin sinifê pêşdibistanê.

Bernameyeke taybetî ya dibistana bingehîn ya perwerdeya taybetî (grundsärskolan) jî ku dişibe bernama dibistana taybetî heye. Lê ev bername sinifê pêşdibistanê nahewîne nav xwe.

Herdu beşên pêşî – Nirxê bingehîn û erkê dibistanê tevî armanc û hedefên giştî – ji bo sinifê pêşdibistanê û malên dema vala derbas dibin. Lê beşê sêyem yê bernama perwerdê – Bernama dersên dibistanê- ji bo sinifê pêşdibistanê û malên dema vala derbas nabe ji ber ku perwerda wira ji dersan pêk nayê. Bi xwendina herdu beşên destpêkê yên bernama perwerdê tê bibînî bê tu dikanî çi bendewarî û daxwazan ji sinifê pêşdibistanê bikî. Hemî pêşdibistan divê li gor bernama perwerdê tevbigerin.

MAFÊ SINIFÊ PÊŞDIBISTANÊ

Mafê hemî zarokên li Swêdê ye ku ji şeş salîya xwe û pê de di termîna payîzê de dest bi sinifê pêşdibistanê bikin. Beledî mecbûr e cîyekî ji zaroka te re peyda ke. Lê ji bo te û zaroka te sinifê pêşdibistanê bi dilxwazî ye. Berya şeş salîya xwe jî zarok dikanin dest bi pêşdibistanê bikin. Bi gotineke din sinifê pêşdibistanê ne mecbûrîyet e.

Pêşdibistanên beledîyê, yên dewletê û yên serbixwe hene. Li pêşdibistanên girêdayî beledîyê desteyeke sîyasî ya hilbijartî dinere. Berpirsîyarîya pêşdibistanên serbixwe rêvebirîyek dike. Pêşdibistanên taybetî û yên samî girêdayî dewletê ne.

Gav bi gav di perwerda jîyanê de

Di sinifê pêşdibistanê de awa û metotê kar yê pêşdibistan û dibistanê dikane bê têkelkirin. Ev armanceke sinifê pêşdibistanê ye û nîşanek xweser dide sinifê pêşdibistanê. Li vir du awayên xebatê bi wekhevî û cudahîyên xwe têkel dibin û wek metodekî sêyem derdikeve pêş – xebateke ku di çavên zarokan de du beşên herî baş yên du cîhanan digihîne hev. Mirov dikane bibêje ku sinifê pêşdibistanê pireke di navbera pêşdibistan û dibistanê de.

Bingeha sinifê pêşdibistanê divê demokratîk be. Pêwiste personel hewake vekirî û demokratîk avabikin da ku her şagirt bikaribe nirxê xwe û yê kesên xeyrî xwe bibîne û bijî.

Sinifê pêşdibistanê divê pêşketin û fêrbûna şagirtan teşwîq bike, wan ji bo perwerda pêş hazir bike û ahengîya wan pêş de bibe. Lîstik, afirandin û keşif beşên girîng yên perwerdê ne û divê mirov miqateyî meraq û hewesa zarokan be. Niqteya hereketê ew e ku pêşketin û fêrbûn bêrawestan û bêmekan e. Perwerda sinifê pêşdibistanê divê imkanan ji zarokan re biafirîne da ku ew li gor armancên giştî yên beşê duyem yê bernama perwer-

dê pêşkevin. Ev hedef ji bo tevaya dema dibistana bingehîn derbas dibe û bi qedandina sinifê pêşdibistanê dawî lê nayê. Lê karê ku di sinifê pêşdibistanê de tê kirin bi gelek awayan zarokan ber bi armancê ve dibe. Çend armancên ku bi qedandina dibistana bingehîn re her şagirt bigihîjê ev in:

- Rêz ji nirxê kesên din re digre,
- Dikare zimanê fermî yê swêdî binivîse, biaxive û nuanse bike,
- Dikare ji bo berdewamîya xwendinê û di bikaranîna rojane de matematîkê bifikire û
- Xwe berpirsê dersên xwe û rewşa kar dibîne.

Her sinifê pêşdibistanê bi rengekî ye

Bernama perwerdê bê ku cî liberçav bigire divê dana perwerdeyeke wekhev bide hemî şagirtên ku diçine sinifê pêşdibistanê. Lê awayên kar li pêşdibistanan dikanin cuda bin. Tiştekî ku li pêşdibistanekê guncav e dibe ku li hineke din neyê. Xebat divê li gor şagirtan hatibe eyarkirin û du komên şagirtan ku dişibin hev nînin.

Eger pirsgirêk derkevin û tu nikanibî wan bi personel yan midûr re çareser bikî serî li beledî, dewlet yan rêvebirîyê bide. Berpirsên sereke yên sinifê pêşdibistanê ew in.

Hevkarîya bi malê re

Di bernama perwerdê de nivîsandîye ku mamoste berpirse ku li ser rewşa zaroka te ya li dibistanê bênavbir te agahdar bike û bi te re hevkarîyê bike. Ew herwiha divê derbarê dilxweşî û pêşketina zanîna zaroka te jî te agahdar bike. Ev dikane bi gelek awayan pêk were; nameyên heftane, civînên dêûbavan hwd û axavtinên rojane. Tu herdemê dikanî agahîyan bixwazî yan bi awayekî din balkêşîyê ji bo zarok û pêşdibistanê nîşan bidî. Herwiha eger tiştekî taybet bûbe tu dikanî personelan haydar bikî. Li gor qanûna dibistanê herî kêm salê carekê divê tu, zaroka te û mamosteya zaroka te li hev bicivin û derbarê pêşketina zarokê de biaxivin. Dema hûn li hev rûniştin bernama perwerdê dikare destek be.

Vill du läsa hela läroplanen?

Läroplanen bör finnas i alla förskoleklasser. Du kan beställa eller ladda ned läroplanen på Skolverkets webbplats www.skolverket.se

ISBN: 978-91-87115-48-6
Grafisk form: AB Typoform
Omslagsfoto: Fotograf Michael McLain
Foto inlaga: Fotograf Michael McLain
Skolverket 2012

Skolverket